

Em zimanê kurdî binasin

Let's look into kurdish





Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê: 19
Publications of The Kurdish Institute of Istanbul: 19

Çapa Yekemîn: Tîrmeh 2001
First Edition: July 2001

Ê ku ji Kurdî Wergerandiye Tirkî: H. Kaya
Translated from Kurdish to Turkish by H. Kaya

Ê ku ji Kurdî Wergerandiye Îngilîzî: Samî Hezîl
Translated from Kurdish to English by Sami Hezil

Çapxane: Berdan Matbaacılık
Printing: Berdan Matbaacılık

ISBN
975-973 31-1-0

Navnîşan/Adress: Zend Bilim Kültür Eğitim
Basın Yayın Ltd. Şti.
Atatürk Bulvarı, Ceylan Palas Apt., No: 154/12
Aksaray-İstanbul
Tel: (0212) 527 19 11
Fax: (0212) 527 61 49

EM ZIMANÊ KURDÎ BINASIN LET'S LOOK INTO KURDISH

AMADEKAR / WRITTEN BY

- Hasan Kaya
- Zana Farqînî
- Sami Tan



Em Zimanê Kurdî Binasin

Destpêk

Li Rojhilata Navîn kurd di bin serweriya çar dewletan de dijîn, ev dewlet jî Tirkîye, Îran, Irak û Sûriye ne. Zimanê fermî yê van dewletan tirkî, erebî û farisî ye.

Zimanê tirkî ji malbata zimanê ural-altay, erebî ji ya Semîtîk û farisî jî, ji ya îndo-ewropî ye. Ji van zimanan tenê kurdî û farisî ji heman koma zimanî ne. Lê belê li vir tiştekî seyr heye. Hem rêveberiya ereb û hem jî ya fars hebûna kurdan wek kurd û zimanê wan jî wek zimanekî serbixwe dipejirînin. Lê nêrîna fermî ya rêveberiya Tirkîyeyê, vê yekê red dike û dibêje ku kurd bi binyada xwe ve tirk in.

Ev raman bi taybetî piştî damezîrana komarê serdest bûye û wek bîrdoza fermî hatiye parastin. Em dizanin ku, beriya komarê, kurd wek qewmekî cihê û zimanê wan jî wek zimanekî serbixwe dihatê dîtin. Ji bo nimûne, Evliya Çelebi di berhema xwe ya navdar 'Seyahatname'yê de behsa zimanê kurdî û zaravayê wê dike. Evliya Çelebi, dide xuyakirin ku zimanê kurdî zimanekî dêrin ango qedîm e û ji zimanên mîna farisî, dêrî û îbrî cuda ye.

Her wiha, Şemsettin Sami, di *Kamus'ül Alâm'a* xwe de û Ziya Gökalp jî di gotar, daxuyanî û berhema xwe ya bi navê '*Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*'ê de, amaje dikin ku kurdî bi

tu awayî naşibe zimanên din û kurdî zimanekî dewlemend û serbixwe ye.

Lê piştî avakirina komarê, nemaze bi qanûna bingehîn a sala 1924'an, hebûna kurdan tê redkirin, her kesê li Tirkiyeyê dijî mîna tirk tê pejirandin. Peyvên mîna kurd, kurdî û Kurdîstan, ku di gelek belgeyên fermî yên Osmanî û Tirkiyeyê de dihatin bikaranîn, têne qedexekirin.

Hemû zanyarên ku li ser zimanê kurdî lêkolînên zanistî kirine didin xuyakirin ku, kurdî zimanekî serbixwe ye û tu têkilî û pêwendiya wê ne bi tirkî û ne jî bi erebî re heye. Li hêla din, kurd arî ne û ew farisan lêzîmên hev in, zimanên wan jî, ji heman koma zimên e. Lê her yek jê zimanekî serbixwe ye.

Ji mêj ve kurdan bi zimanê xwe perwerde û hîndekariyê dikirin. Li medreseyan li ser mijarên wekî matematîk, mantik, gramer, fiqih û hwd. perwerdehî bi zimanê kurdî û erebî dibû. Ev medrese piştî avakirina komarê hatin qedexekirin. Her wiha ligel vê yekê, weşan û nivîsandina bi kurdî jî hatin qedexekirin.

Îro, rewş piçek guheriye, Wekî berê bi tundî înkara kurdan û zimanê kurdî nayê kirin. Hejmara kesên ku vê yekê dikin, hindik e. Kesên statukoparêz, hebûna zimanê kurdî qebûl dikin, ancax zimanê kurdî wek zimanekî paşvemayî û cîgehî (mehelî) bi nav dikin û hebûna zarava û devokên di zimanê kurdî de jî wek asteng li pêşiya perwerde, hîndekarî û weşanê didine nîşandan.

Rast e, di kurdî de zarava û devok hene. Ev rewş, ne tenê xweserî zimanê kurdî ye. Di hemû zimanan de zarava û devok hene. Standardbûn tenê di zimanê nivîskî de heye, ne di yê devkî de. Kîjan gel an netewe dikare biangiştîne (îdea bike) ku hem zimanê wan ê devkî û hem jî yê nivîskî zimanekî hevgiretî û standard e!...

Rewşa zimanê standard bi rewşa dewlet-nete-

we, dewleta modern ve têkildar e.

Dibêjin zimanê kurdî, zimanekî têkilhev û col e. Tu kes bi awayekî zanistî nikare bibêje ku filan ziman xwerû û sade ye. Di hemû zimanan de peyvên biyanî hene. Ji bo vê rewşê em nimûneyeke balkêş li vir bidin. Di zimanê hemû gel û neteweyên misilman de serdestî û bandora zimanê erebî berbiçav e. Her wiha di zimanê gelên îsewî de jî mirov rastî hîkarî û bandora zimanê latînî tê. Ev rewşa hanê ji ber ol û dîn e. Ji ber ku zimanê mizgeftê û Quranê erebî û yê dêrê jî latînî ye.

Ji bilî vê yekê, hemû gelên cîranên hev ji ber sedemên cihê, ji aliyê zimên ve jî bandor li hev kirine û peyv dane hev û ji hev standine.

Îro em bi awayekî zelal di zimanê tirkî, kurdî û farisî de rastî peyvên erebî tîn, her wiha van her çar zimanan ji hev û din peyv standine û dane hev. Ji ber ku wêjeya farisî demekê gelên wekî kurd, ereb û tirk ji xwe re hijmetkar hiştiye lewma jî peyvên wî zimanî ketine nav zimanê van gelan. Ev jî tiştekî asayî û siruştî ye.

Kurd, gelekî dêrin ên vê herêmê (Mezopotam-yayê) ne û xwedî şaristaniyeke zengîn in. Ji pêşiyên kurdan pir bermayî mane, ku hinek jê berhemên nivîskî ne. Ji belgeyên ku bi dest ketine, em pê dihesin ku kurdan ji berê de nivîs bi kar anîne.

Belê, ev kitêbok ne li dû aşkerakirin û peyitandina wan tiştan e ku li cîhanê gelek pispor û mirovên sade jî pê dizanin. Lê ji ber ku di van demên dawîn de, li ser mijara zimanê kurdî û kurdan gelek gengeşî û hewlên berevajîkirina rastiyan pêk hatin û di van gengeşîyan de ne pisporên mijarê yên kurd û ne jî saziyên wek enstîtuyê hebûn, ji lew re me pêwîst dît ku em bi awayekî puxtayî ji mijarên li ser zimanê kurdî behs bikin. Em xwedî wê baweriyê ne ku, ev kitêbok dê bi kêr bê da ku gengeşî û nîqaş li ser zemîneke rast bîn kirin.

Alfabeyên ku kurdan bi kar anîne

Palpişt û belgeyên di dest me de, bi me bidin zanîn ku kurdan bi dirêjîya dîrokê re gelek alfabe bi kar anîne. Lê belê em pê nizanin bê kurdan serê pêşîn kîjan alfabe bi kar aniye û kengê dest bi nivîsandina nivîsê kiriye. Ji bilî alfabeyên ku em dê li jêrê bidin, kurdan xetên aramî, suryanî û grekî jî bi kar anîne.

Alfabeyên ku heta niha kurdan bi kar anîne ev in:

1) Nivîsa mixî: Medan şeş (6) tîpên din jî bi ser ve kirine û hejmara tîpên vê alfabeyê ji sî û şeşan (36) derxistine çil û duduyan (42). Ev alfabe ji çepê ber bi rastê ve tê nivîsandin.

2) Alfabeya Avesta: Ev alfabe ji çil û çar (44) tîpan pêk tê û ji hêla rastê ber bi hêla çepê ve tê nivîsandin. Hin çavkanî destnîşan dikin ku, çil û heşt (48) tîpên alfabeya Avesta hene.

3) Alfabeya Aramî: Belgeyên herî kevn ên kurdî bi vê alfabeyê hatine nivîsandin, ev belge li şikeftên herêma Hewremanê hatine dîtin. Her wiha tê gotin ku nivîsarên Kurdî bêhtir bi vê alfabeyê ne. Belgeyên hatine dîtin, ku nivîs li ser çermê xezalan e, ji nav wan ên herî kevn ji salên 88-87 ên beriya zayînê ne.

4) Alfabeya Berê ya Pehlewî. Bi vê alfabeyê, bi navê 'Dînkêrd' pirtûkek bi zaravayê soranî hatiye nivîsandin.

5) Alfabeya Masî Soratî: Dîrokzanê Erebiyê Ibn Wehşîye, di pirtûka xwe ya ku di sala 855'ê zayînê de qedandiye, dibêje kurdan ev alfabe (Masî Soratî) bi kar aniye û sê (3) berhemên ku bi vê alfabeyê hatine nivîsandin jî dîtin. Ev alfabe sî û şeş (36) tîp bûne, lê kurdan şeş (6) tîpên din jî lê

zêde kirine.

6) Alfabe ya ku Kurdên Êzîdî bi kar tînin: Bi sedan sal e ev alfabe ji aliyê kurdan ve tê bikaranîn û ji sî û yek (31) tîpan pêk tê. Ji milê rastê ber bi milê çepê ve tê nivîsandin. Hinek kes ji vê alfabe yê re 'Alfabe ya Sirê' (ango Huruful el Sır) jî dibêjin. Pirtûka olî ya pîroz a Êzîdîyan *Mushefa Reş û Cîlwe* bi vê alfabe yê hatine nivîsandin.

7) Alfabe ya Erebi ya Kurdî

8) Alfabe ya Latîni ya Kurdî

9) Alfabe ya Kirîli ya Kurdî

Ji bilî van alfabe yan, li Hêrêma Zêwê ya Rojhilatê Kurdistanê, çav bi cureyeke nivîsê hatiye ketin ku li ser tepsîyeke zîvîn e. Li gor lêkolîneran, ev nivîs ji beriya zayînê (beriya mîladê) jî sedsala 8'an maye û ev nivîs aîdê medan e. Ji bilî vê belgeyê, li cihekî din kes rastî heman cureyê nivîsê nehatiye.⁽¹⁾

Di nav zimanê cîhanê de zimanê kurdî

Zimanê kurdî, her wekî ku gelek zimanzan û kurdzanan jî destnîşan kiriye, ji malbata zimanê îndo-ewropî ye. Di nav vê malbatê de kurdî, ji koma zimanê Îranî ye. Ji nav koma zimanê îranî jî, li milê bakurê rojava dikeve. Niha em navên hin zimanên ku di koma zimanê Îranî de cih digirin bidin:

Farisî, kurdî, belûcî, osetî, yexnûbî, peştoyî, pamiirî û hwd.

Ji bo ku cihê zimanê kurdî xweş diyar û zelal bibe, em bala xwe berdin ser senifandina zima-

nan. Zimanzan, wek adet zimanan ji du aliyan ve disenifnin û vê yekê li gorî şêwe û binyadê dîkin.⁽²⁾

a) Ji aliyê şêweyê ve ziman

Zimanzan ji aliyê şêweyê (morfolojiyê) ve zimanan li sê koman parve dîkin:

1) Zimanên yek-kîteyî: Zimanên çîn û tîbetê gişt bi vî rengî ne.

2) Zimanên pêvekî: Tirkî û macarî pêvekî ne.

3) Zimanên tewangbar: Zimanên îndo-ewropî û samiyî tewangbar in.

Ji ber ku zimanê kurdî jî, zimanekî tewangbar e⁽³⁾ divê em li ser tewangbariyê çend tiştan bibêjin. Zimanzan tewangbariyê wiha rave dîkin: *“Tewang di dema kişandinê de guherîna rayekê (qurm, kok), bi taybetî jî guherîna dengdêrên rayeka lêkerê ye.”*⁽⁴⁾

Ji bo zimanên tewangbar mînak herî navdar erebî ye. Di erebî de dengdar (konsenant, bêdeng) wekî xwe dimînin û bi dengdêrên (vokal, bideng) ku têne serî û dikevî nava peyvê, bêje pêk tînin. Mînak, *ktp* sê dengdar in û bêjeyên *kîtap, mektep, katîp*, hwd. bi guherîna dengdêran pêk tînin. Dîsa *chl* sê dengdar in, her wiha bi guherîna dengdêran peyvên mîna, *cahîl, cehele, çêdîbin*.

Di kurdî de cureyên peyvê yê guherbar dîtin ango li gorî peywira ku digirin ser xwe diguherin. Ev yek heta bigihe rayeka lêkerê jî diguhere. Ji bo nimûne lêkera *kirin*, di dema niha de dibê */di-k-im/*, li vê derê jî lêkerê tenê tîpa */k/yê* dimîne. Em nimûneyeke din jî bidin, lêkera *parastin*. Em vê lêkerê bi dorê, li gorî dema bikişînin. Pêşî li gorî dema niha.

ez di-parêz-im

ez, cînavka kesê yekemîn ê yekejimar (ji desteya cînavkên netewandî, xwerû)

di, qertafa dema niha

parêz, qurmê lêkerê (ya fermanî)

im, jî qertafa kesê yekemîn ê yekejimar

Niha jî em li gor dema borî bikişînin:

min parast

min, cînavka kesê yekemîn ê yekejimar (ji desteya cînavkên tewandî)

parast, qurmê lêkerê (ya dema borî)

Wek ku jî mînakan jî xuya dibe, di kurdî de ne tenê dengdêr her wisa dengdar jî diguhere. Çawa jî lêkera 'parastin'ê xuya dibe, di çaxê kêşana dema niha de, de qurmê lêkerê (parêz) de, /a/ bûye /ê/ û /s/ jî bûye /z/.

Li aliyê din, di tirkî de tu car di dema kêşanê de rayeka lêkerê naguhere, her tim wekî xwe dimîne. Çawa ku rayek naguhere her wisa dengdar û dengdêrên wê jî li dengê din naguherin. Mînak, lêkera çûn '*gitmek*' e, koka wê /git/ e, mirov dikare gelek qertafên kişandinê û dariştinê bîne dawiya wê, wekî *gittim, gidildi, gidecet, gitmişlerdi* û hw.

b) Ji aliyê binyadê ve ziman

Ji aliyê binyadê ve zimanan li pênc komên se-reke lêkve dikin:

- 1) Îndo-Ewropî (îngilîzî, fransîzî, kurdî, farisî)
- 2) Semîtîk (erebî, îbranî, akadî)
- 3) Bantû (zimanên başûr û naverasta Afrîkayê)
- 4) Zimanên Çînî (zimanên çîn û tîbetê)
- 5) Ûral-Altay (finî, macarî, ûygûrî, tirkî, moxolî)

Çawa ku me li jorê jî dabû xuyakirin, zimanê

kurdî zimanekî îndo-ewropî ye. Dema mirov bala xwe dide zimanên îndo-ewropî mirov rastî gelek peyvên nêzî hev tê. Ew rewşa hanê ji bo hemû zimanê ku di heman malbat û komê de ne, wisan e. Niha jî ji bo vê yekê em tabloya jêrîn derpêş bikin.

<u>Kurdî</u>	<u>Îngilîzî</u>	<u>Almanî</u>	<u>Fransîzî</u>	<u>Farisî</u>	<u>Grekî</u>
stêr	star	stern	astre	sitare	astron
kurt	short	kurz	court	-	-
lêv	lip	lippe	levre	leb	-
jenû	-	-	geneou	-	-
dilop	drop	tropfen	-	-	-
nav	name	name	nom	name	-
no/na	no	nein	non	-	-
tu	-	du	tu/te	-	-
nû/niwe	new	neu	neu	-	-
neh	nine	neun	neuf	-	-
dot	douther	-	-	-	-
bira	brother	-	-	brader	-

Li ser vê mijarê Minorsky⁽⁵⁾ wiha dibêje: *“Kurdî jî wekî farisî yek ji zimanên rojavayê Îranê ye. Her wekî Andreas, Salamann, O. Mann, Meillet, Lent, T. Tedesco jî gotiye, zimanê rojavayê Îranê dibin du bir, bakur û başûr, ew her du bir tevî hev bûne. Digel vê yekê jî, di zimanên îroyîn de gelek tiştên ji hev re biyanî hene, kurdî û farisî ji gelek aliyên ve xwediyên taybetiyên serbixwe ne. Ango zimanê kurdî dikeve birê bakurê rojavayê zimanê îranî.”*

Gelek kes, ji ber ku zimanê kurdî û farisî xwediyê gelek peyvên hevpar in, zimanê kurdî wekî zaravayekî farisî bi nav dikin, lê zimanzanên ku li ser kurdî xebat kirine vê yekê red dikin. Ligel vê yekê em dîsan dixwazin cudahiyên di navbera kurdî û farisî de bidine xuyakirin.

Cudahiyên di navbera kurdî û farisî de

Zimanê Kurdî û faris ji ber ku di heman komê de ne, ji hin aliyan ve nêzî hev in. Ji ber vê yekê, hin dewletên ku li ser kurdan serwer in, hebûna kurdan napejirînin û zimanê wan wek zimanekî col (têkilhev) û xerabûyî yê farisî bi nav dikin. Pê namînin û vê yekê ji baweriyên xwe yên siyasî û perspektîfên xwe yên paqijkirina etnîkî re dikin kerese (malzeme). Ev îstismara hanê, ji awira zaniştî gelekî dûr e. Lewma em pêwist dibînin ku cudahiyên van her du zimanan bi awayekî serkî be jî, li ber çavan raxin. Çendî ku ev her du ziman nêzî hev bin, ew qas jî, ji hev cihê ne û her yek ji wan zimanekî serbixwe ye.

Kurdî zimanekî zayendî ye, ango nêr û mêtî tê de heye, lê ev yek di farisî de tune. Di kurdî de (di kurmancî û kirmanckî/zazakî de) du kom cînavk hene, lê di farisî de em rastî tişteki wiha nayên. Ev her du komên cînavkên di kurdî de, di lêkerên gerguhêz de ji hev cuda tene bikaranîn, ango zimanê kurdî zimanekî ergatîv e. Mînak ji bo zaravayê kurmancî:

Min nan xwar.

Ez nên (nanî) dixwim.

Mînak ji bo zaravayê kirmanckî:

Min nan werd

Ez nanî wena

Her wiha di zimanê kurdî de nêr û mêtî di cînavkên kesîn û nîşandanê de jî heye, lê belê di farisî de tişteki wiha nîn e. Ji bilî vê yekê, di kurdî de du kom cînavkên nîşandanê hene, farisî ne

xwedî taybetiyeke wiha ye.

Em dikarin gelek cihêtîyên van her du zimanan destnîşan û amaje bikin. Lê belê ya baş ew e ku em gotinê bidin Vladimir Minorsky bê ka ew der barê van her du zimanan de çi dibêje. Kurdnas V. Minorsky dide xuyakirin ku, zimanê kurdî û farisî ji hev cihê ne û yer yek ji wan, zimanekî serbixwe ye. Mînorsky aşkera dike ku di navbera kurdî û farisî de pênc cudahiyan girîng hene:⁽⁶⁾

1) **Denganî:** Denganiya (fonetîka) kurdî ji ya farisî cihê ye.

2) **Guherîna dangan:** Peyvên ku ji heman kokê tên jî, ji aliyê deng ve guherîneke mezin di wan de çêbûye.

3) **Cudahiya şeklan:** Ji cînavkan bigire heta bi kêşan û çevana lêkeran, ji qertafên cînavkên xwedaniyê bigire heta bi qedaneka navdêran û hwd cudahî heye.

4) **Cudahiya peyvsaziyê.**

5) **Cudahiya peyvan.**

Zaravayên kurdî

Li ser mijara zaravayên kurdî gelek nêrînên ji hev cihê hene. Nemaze hin kesên ku naxwazin hebûna kurdan û zimanê wan bipejirînin, hemû devokên kurdî wekî zarava nîşan didin û hin caran zarava jî wekî ziman didine xuyakirin. Lê ev kêşe û arîşeya hanê, ji mêj ve ji hêla zimanzan û kurdnasan ve hatiye ronîkirin.

▼ Hê di sedsala 16'an de Şerefxanê Bedlîsî di berhema xwe ya navdar *Şerefnameyê*⁽⁷⁾ de zaravayên kurdî wiha rêz dike:

- 1) Kurmanc
- 2) Lor
- 3) Kelhûr
- 4) Goran.

▼ Li gorî G. Girvinli ku di salên 1836–37'an de li ser etnografiya kurdî hinek lêkolîn kirine, zimanê kurdî dibe du beş: kurdiya jêrîn û kurdiya jorîn.

▼ Peter Lerch (1857-58) kurdî li pênc zaravayan dabeş dike: zaza, kurmancî, kelhûrî, gûranî û lûrî...

▼ Oscar Mann, kurdî wekî kurdiya rojava, rojhilat û başûr dike sê beş. Mann, goranî û zazakî wekî kurdî napejirîne.

▼ E. B. Soane, di berhema xwe ya bi navê *Grammar of Kurmanji or Kurdish Langaage* (1913) de, kurdî li sê beşan parve dike: kurmanciya jorîn, kurmanciya jêrîn, lorî-zaza (hewramî û goranî).⁽⁸⁾

▼ Ziya Gökalp, di xebata xwe ya bi navê *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler* de,⁽⁹⁾ kurdî wek pênc zarava hildaye dest: kurmanc, zaza, soran, goran û lor. Gökalp daye zanîn ku, ev gişt zarava ji kurdiya qedîm derçûne.

▼ Dr. Mac Kenzie, kurdî dike sê kom: koma bakur, koma navîn û koma başûr.

▼ Cemal Nebez jî kurdî dike çar beş: kurdiya bakur, kurdiya navîn, kurdiya başûr, goranî-zazayî.

▼ Alaedîn Secadî, di berhema xwe ya bi navê *Destûr û Ferhengî Zimanî Kurdî, Erebi û Farisî* de, zimanê kurdî dike du beş: kurmanciya behdî-

nî û soranî.

▼ Li gorî Dr. Kemal Fuad zimanê kurdî çar zarava ne: 1) kurdiya rojava (jorîn) 2) kurdiya rojhilat (jêrîn) 3) kurdiya başûr 4) kurdiya zaza-kî-goranî.

▼ Fuat Heme Xurşîd, di berhema xwe ya bi navê *Zimanî Kurdî, Dabeşbûnî Cografyayî Dîyalêktekanîy* de, zimanê kurdî wiha dabeş dike: 1) kurmanciya bakur 2) kurmanciya navîn 3) kurmanciya başûr 4) goranî.

▼ Emîr Hesepûr⁽¹⁰⁾, di xebata xwe ya bi navê *National and Language In Kurdistan (1918-1985)* zimanê kurdî dike dike çar zarava: kurmancî, koranî, hewramî, kîrmanşanî.

Ji xebatên van zimanzan jî diyar dibe ku, bi piranî ew xwediyê wê raman û hizrê ne, ku di kurdî de çar zarava hene:

- 1) kurmancî (kirdaskî)
- 2) kurmanciyanaverast (soranî)
- 3) kirmanckî (kirdkî, zazakî-goranî)
- 4) loranî.

Kurmanciya bakur (kurmancî) û kurmanciya başûr (soranî) du zaravayên sereke ne. Ev her du zarava wekî zaravayên ku xwediyê wêjeyê nivîskî ne, têne pejirandin. Van demên dawîn, zaravayê kirmanckî (dimilkî-zazakî) jî hêdî hêdî ber bi nivîskîbûnê ve gavan diavêje.

Di nav zaravayên kurdî de zaravayê ku herî zêde pê tê axaftin kurmancî ye. Kurmancî li hemû deverên ku kurd lê dijîn pê tê axaftin.

Li Tirkîyeyê bi tenê Kurmancî û zazakî hene. Ji bilî çend deverên mîna Anatoliya Navîn û Qe-

rejdxê, ku şêxbizinê lê dijîn. Ev jê devoka soranê ye.

Tevliheviya di warê zaravayan de pirî caran jê, ji ber navlêkirinê tê. Wek nimûne, ji bo kurmanciya bakur, li başûr behdînê û li rojhilat jê şikakê tê gotin. Her wiha ji bo zaravayê kurmanciya jêrîn jê, kurmanciya xwarû, soranê tê gotin. Heman tevlihevî di warê dimilkê de jê balê dikişîne. Navên wekî kirdkî, kirmanckî, dimilî, dêrsimkî, sobê hwd. têne bikaranîn. Ji bo hewramî jê navê goranê tê bikaranîn.

Wekî ji mînakên jorîn jê xuya dibe, navên ku hemû lêkolîner li ser li hev dikin, navên mîna kurdî, kurmancî, kirmanckî û kirdkî ne. Navên din tev navên herêm û êl û eşîran in.

Devokên zaravayên kurdî

Kesên ku naxwazin zimanê kurdî wek zimanekî serbixwe bipejirînin, axaftina her bajarî, heta ya her gundî wekî devok, heta hin caran jê wekî zarava bi nav dikin. Çawa ku di hemû zimanan de zarava û devok hene, wisa di zimanê kurdî de jê hene. Em ji bîr nekin ku standardî di zimanê nivîskî de heye, lê di zimanê devkî de. Bêyî mûdaxele û statûya siyasî, zimanê standard pêk nayê.

Ehmedê Xanî (sedsala 17'an), di berhema xwe ya navdar Mem û Zînê de⁽¹¹⁾ zaravayê kurmancî li ser sê devokên bingeîn pareve kiriye. Em vê peyt û tespîta wî bi malikeke ji şahesera wî nîşan bidin:

*Bohtî û mehmedî û silîvî
Hin la' l û hinik ji zêr û zîvî.*

Mirov dikare vê gotina Ehmedê Xanî ji bo de-

vokê kurmancî wekî bingeh bigire. Bi awayekî giştî lêkolîner, devokên zaravayên din jî wiha rêz dikin:

Kurmanciya naverast (sorani): silêmanî, muk-rî, sineyî.

Kirmanckî (zazakî): devoka Dêrsimê û devo-ka Siwêregê.

Hevoksazî

Hevoksazî, bi me dide zanîn bê cureyê peyvan di kîjan devera hevokê de cih digirin û çawa bi hev ve têne girêdan. Ango hevoksazî, rewşa peyvan û celebê peyvan a li hemberî hev û din e. Di kurdî de, di navbera peyvan de pêwendî û girêdan wiha pêk tê:

Di kurdî de peyv, bi alîkariya veqetandekan (harfî tarîf) bi hev ve têne girêdayîn. Veqetandekên di kurdî de du çeşîd in; diyar û nediyar. Pêşî em ji bo veqetandekên diyar mînakan bidin.

mala mezin (navdêr-rengdêr)
mastê we (navdêr-cînavk)
keçên bedew (navdêr-rengdêr)

Ji bo veqetandekên nediyar jî mirov dikare van wekokan bide.

maleke mezin
mastekî tirs
keçine bedew

Her wekî ji mînakan jî xuya dike, pevgirêdana peyvan di kurdî de dijberî ya tirkî ye. Mînak:

mala min

Heke em vê terkîbê bi tirkî binivîsin, dê wiha be:

Benim evim

Di vê mînakê de aşkera dibe ku hem veqetandekên her zimanan û hem jî cihê hêmanan ji hev cihê ne. Di kurdî de veqetandek bi navdêrê ve dibe lê bi cînavkê ve nabe. Di tirkî de îcar veqetandek bi cînavkê ve dibe, lê bi navdêrê ve nabe.

Hevoksaziya kurdî, her wiha ji gelek aliyan ve ji hevoksaziya farisî jî vediqete. Der barê vê yekê de em guh bidin peyitandinên V. Minorsky: “*Sentaksa kurdî ji aliyê peyvên hevedudanî û lêkerên gerguhêz ve her du (kurdî û farisî) ziman ji hev cuda dibin.*”⁽¹²⁾

Di zimanê kurdî de rêza hêmanên hevokê ji yên tirkî û farisî cuda ye. Di hevokên tirkî yên sererast de pêveber tim li dawiya hevokê ye. Mînak:

Ben Dün Ankara'ya gittim. (kirde+ têrker+pêveber.)

Em vê hevokê bi kurdî saz bikin:

Ez duh çûm Enqereyê. (kirde+têrker+pêveber+têrker.)

Ji bo ku hevokek bê sazkin, du hêmanên bingehîn divên. Ew hêman, kirde û pêveber in. Em bi nimûneyan ji sivikiyê ber bi giraniyê hevokan tevî hêmanan bidin:

ez	çûm
kirde	pêveber

Bi tenê pêveber jî dikare hevokekê pêk bîne. Her wekî ji mînaka li jor jî diyar dibe, ku mirov

cînavka kesê yekemîn a yekejimar /(ez/ biavêje, /çûm/ bi serê xwe jî hevokekê pêk tîne. Di hevokên sanahî de, kirde tê serî û pêveber tê dawiyê. Hevoksaziya lêkerên gerguhêz û negerguhêz jî hev cuda ye. Bi kurtasî, li gorî kompleksbûna hevokê, cihê hêmanên wê diguhere.

Hêmanên hevokê wiha li dû hev rêz dibin.

1) Kirde+têrker+pêveber

Tu	li serê çiyayê Sîpanê	dijî.
kirde	têrker	pêveber

2) kirde+bireser+têrker+pêveber

Şivên	nanê xwe	dereng xwar.
kirde	bireser	têrker pêveber

3) Kirde+têrker+pêveber+têrker

Hûn	dê tu caran	neçin	Geverê
kirde	têrker	pêveber	têrker

Di kurdî kirpandina kîjan hêmanê bê xwestin, ew hêman nêzîkî pêveberê dibe. Mînak:

Ez ê kevirekî bi tevşo bişikînim.

(3) (2) (1)

Ez ê bi tevşo kevirekî bişikînim.

(3) (2) (1)

Kevirekî bi tevşo ez ê bişikînim.

(3) (2) (1)

Bi tevşo kevirekî ez ê bişikînim.

(3) (2) (1)

Mirov di kurdî de rastî hevokên şikestî jî tê. Ev hevok bêhtir di hebest, axaftin û gotaran de têne dîtin.

Piştî ku roja me bû [pêveber] tarî, mirin xweş-tir e [kirde] ji amberê (Ehmedê Xanî).

Taybetiyeke balkêş a zimanê kurdî, ergatîvbûna wê ye. Hevokên ku bi lêkerên gerguhêz têne sazkirin, ji yên negerguhêz cuda ne. Ji ber vê yekê jî di kurdî du kom cînavk hene, her wiha lêker jî hin caran li gorî kirdeyê, hin caran jî li gorî bireserê têne kişandin. Mînak:

*Ez te dibînim.
Min tu dîtî.*

Di hevoka yekemîn de lêker li gorî kirdeyê (ez), di ya duyem de jî li gorî bireserê (tu) hatiye kişandin. Ligel vê taybetiya ku me li jor dabaş kir, di lêkerên gerguhêz de mêjera navdêrê di demên borî de, di lêkerê de diyar dibe. Mînak:

*Min sêv xwar.
Min sêv xwarin.*

Di mînaka yekem de /sêv/ yekejimar e û di hevoka duyem de jî /sêv/ pirejimar e.

Di demên bê û niha de, pirejimarî ji bireserê diyar dibe. Nimûne:

*Ez sêvê dixwim.
Ez sêvan dixwim.*

Zayend

Kurdî zimanekî zayendî ye û hemû peyv an nêr in, an jî mê ne. Ji bilî heyberên candar, heyberên necandar jî xwediyê zayendê ne, lê ev zayendîbûn tişteki rêzimanî ye. Zayenda peyvan bi du awayan, bi veqetandek û qertafên tewangê di-

yar dibe. Peyv bi serê xwe nêtar in. Mînak:

kevçî, çav, pêûs, giyan...

Zayenda bi veqetandekê:

Çavê şîn

pênûsa zirîçî

Di vir de veqetandeka /a/yê mêtîyê û veqetandeka /ê/yê nêrîtiya peyvê nîşan dide.

Zayenda bi tewangê:

siya darê

nikulê dikî

Li vê derê jî, qertafa /ê/yê zayenda mê, qertafa /î/yê jî zayenda nêr nîşan dide.

Veqetandek

Di zimanê kurdî de, terkîb bi veqetandekan tên çêkirin. Ev veqetandek jî nêr û mê ne. Her wiha veqetandekên di kurdî de du cure ne; diyar û ne diyar. Ji ber ku di zimanê kurdî de rewşa navdêran nîn e, bi veqetandek û qertafên tewangê terkîb tên saz kirin.

-ê : yekejimar, nêr û diyar

-a : yekejimar, mê û diyar

-ên : pirejimar, diyar (ji bo her du zayendan)

-ekî : yekejimar, nêr û nediyar

-eke : yekejimar, nêr û nediyar

-ine : pirejimar, nediyar (ji bo her du zayendan)

Tewang

Yek ji taybetiya zimanê kurdî jî tewangbarî ye. Di zimanê kurdî de, hinek beşên hevokê li gorî

erka ku digirin ser xwe diguherin, hinek qertafan digirin; ji vê yekê re tewang tê gotin. Di kurdî de beşên hevokê yên guherbar (lêker, navdêr, cînavk, veqetandek, jimarnav) ditewin. Di kurmancî de, pirjmariya navdêr û cînavkên xwerû bi alîkariya veqetandek û lêkerê diyar dibin, lê di kirmanckî (dimilkî) de pirejmariya navdêrên xwerû bi alîkariya qertafa /-î/yê diyar dibe. Wekî mînak:

Kurmancî:

- Min pênuş bir (yekejimar û binavkirî)
- Min pênuş birin (pirejimar û binavkirî)
- Min pênuşek bir (yekejimar û nebinavkirî)
- Min pênuşin birin (pirejimar û nebinavkirî)

Kirmanckî:

- Min say werd
- Min sayî werdî

Tewanga navdêrên nêr:

Di kurmancî de tewanga navdêrên nêr bi du awayan pêk tê.

- a) Qertafa /î/yê tê dawiya peyvê.
- b) Heke tê de dengê /a/ an jî /e/ hebe, ew deng dibe /ê/. Mînak:

<u>Xwerû</u>	<u>Tewandî</u>
şivan	gopalê şivanî/şivên
nan	nên/nanî bîne
bajar	Zîlan Ronahî ji aşî/êş tê.
nîvîskar	Nivîskêr/nivîskarî xweş nivîsiye
gotîn	gotinê ez êşandim

Tewanga navdêrên mê:

Dengdêra /ê/yê tê dawiya peyvê û tewanga wê

ya mêtîyê pêk tê; mînak:

meha biharê
 porê jinikê

Ji ber ku kurdî zimanekî tewangbar e, cînavkên kesîn du cure ne. Yek jê tewandî ye, yê din xwerû ye.

ên xwerû

ez
 tu
 ew
 em
 hûn
 ew

ên tewandî

min
 te
 wî/wê
 me
 we
 wan

Nîşe: Dema ku daçekê bikeve ber cure peyvên guherbar wan ditewîne.

Peyvsazî

Kurdî, zimanekî wisa ye ku ji pêş, paş û navê ve qertafan digire. Ev qertafên çêkirinê jî di nav xwe de dibin du bir. Yek jê ew qertaf in ku tenê bi wan ji lêkeran, lêkerên çêkirî tînen bidestxistin. Qertafên din jî, tenê bi wan navdêr û rengdêr tînen çêkirin. Her wiha carinan di bastûra (bunyeya) peyvê de guherînek tê pêkanîn û jê navdêr tê peydekirin. Nemaze ev rewş, di raweya lêkera fermanî de çêdibe (ji bo halê negerguhêz ê lêkerê). Nimûne *bi+şewit+e*, /bi/ raweya fermanî, /şewit/ qurmê lêkera fermanî, /e/ jî qertafa kesê duyemîn a yekejimariyê ye. Em tenê qurmê lêkera fermanî hildidin dest û /i/ya di kêteya duduyan de dîkinê /a/ û navdêrê bi dest dixin: şewit, sewat /i/ bû

/a/ û bi vî awayî şewit bû şewat.

Ji bilî vê yekê, ji qurmê lêkera fermanî jî qertafên kirdenavan bi dest tê xistin, nimûne: Ji lêkera kuştinê bi-kuj-e, /bi/ û /e/ bê avêtin dimîne |kuj/, em wê bînin deynin ber peyva /agir/ wê peyveke wiha bê himatê: *agirkuj*.

Em bi berfirehî behs ji qertafan nekin, hema ji bo ku mijar zelal bibe û dabaş bê fêmkirin em dê li ser wan rawestin. Pêşî ji bo lêkeran em qertafan bidin.

a) Qertafên lêkerçêker

- ber+dan = berdan
- da+dan = dadan
- der+anîn = deranîn
- hil+kirin = hilkirin
- ra+ kirin = rakirin
- ro+ kirin = rokirin
- ve+xwarin = vexwarin
- vê+xistin = vêxistin
- wer+girtin = wergirtin
- tê+koşîn = têkoşîn

Niha jî em çend qertafên ku tên paşîya navdêr û rengdêran û bi wan lêkerên sade tên çêkirin bidin:

andin, isandin, ijandin

Bi van qertafan li jorê lêkerên gerguhêz tên bidestxistin. Nimûne:

- saz+andin = sazandin
- nerm+ijandin = nermijandin
- rep+isandin = repisandin

în, isîn, ijîn:

Bi van qertafê hanê jî, lêkerên negerguhêz tên

çêkirin.

rep+isîn = repisîn

saz+în = sazîn

nerm+ijîn = nermijîn

b) Qertafên ji bo daraştina navdêr û rengdêran

Piştî van, îcar em bên ser qertafên ku bi wan navdêr û rengdêr tên çêkirin. Ev navdêr jî dibin du bir; kirdenav (ismî fail) û tiştên nav (ismî meful). Ev qertaf hem tên pêşiya peyvê û hem jî tên paşiya peyvê. Ji bo wan jî em çend nimûneyan bidin: Pêşî parkît (paşgir), di pey re pêrkît (pêşgir) û dawiyê jî em navkîtan (navgiran) bi nimûneyan derpêş bikin.

Bi parkîtan daraştina peyvan:

kar+ker = karker

ber+ek = berek

dar+ik = darik

ser+ok = serok

aş+van = aşvan

rim+baz = rimbaz

guh+ar = guhar

mal+dar = maldar

teng+asî = tengasî

kirîv+ atî = kirîvatî

xwîn+î = xwînî

şer+oyî = şeroyî

yekt+îtî = yekîtî

Bi pêrkîtan daraştina peyvan:

a+şûjin = aşûjin

ber+av = berav

ser+dest = serdest

ne+yar = neyar

tele+bext = telebext
 hem+pa = hempa
 hev+kar = hevkar
 kele+girî = kelegirî
 zir+keç = zirkeç
 bi+kuj = bikuj
 bele+guh = beleguh
 gû+sterk = gûstêrk

Bi navkîtan daraştina peyvnan:

ser+an+ser = seranser
 dest+e+bira = destebira
 şad+û+man = şadûman
 rû+bi+rû = rûbirû

Encam

Her ziman xwedî rê û rêzikan e û taybetî û qalibên wî hene. Ligel vê yekê, hin rêzîkên ku ji bo zimanan pişkdar in, jî hene. Ev rêzîkên hevpişk (muşterek), bi giştî di navbera zimanên ku ji heman malbatî ne de, têne dîtin. Ji lew re, pir tiştekî asayî û siruştî ye ku hin ziman ji hin aliyan ve bişîbin hev û hêlên wan ê hevpar hebin.

Digel vî qasî, ji van mijarên ku em li jorê yeko yeko li serê rawestiyan, xuya dibe ku zimanê kurdî ji gelek aliyan ve hem ji erebî, hem ji farisî hem jî, ji tirkî cuda ye. Bi taybetî em dixwazin balê bikişînin ser cihêtiyên di navbera kurdî û tirkî de. Ji ber ku, hin zimanzan, siyasetmedar û kesên ji pîşeyên cuda yên tirk îdia dikin da ku zimanê kurdî ne tu ziman e û kurd bi eslê xwe jî tirk in. Ji bo ku der barê zimanê kurdî û tirkî de hizr û ramanêke zelal ji kesê meraqdar re çêbe,

em dê bi çend xalên berbiçav cihêtiya van her du zimanan bidin xuyakirin.

✓ Kurdî ji malbata zimanê îndo-ewropî, tirkî ji ya ural-altayî ye.

✓ Kurdî zimanekî tewangbar e, tirkî zimanekî pêvekî ye.

✓ Kurdî zimanekî zayendî ye, tirkî ne wisan e.

✓ Di kurdî de du kom cînavkên kesîn û nîşandanê hene, di tirkî de ev yek nîn e.

✓ Di kurdî û tirkî de awayên çêkirina terkîban dijberî hev in.

✓ Zimanê kurdî, ji pêş, paş û navê ve qertafan digire, lê di tirkî de qertaf tenê tên paşîya peyvê.

✓ Di kurdî de peyv bi du û sê dengdaran jî dest pê dike, lê di tirkî de peyv tenê bi dengdarekê dest pê dike.

✓ Bi kurtî, rêzimana kurdî û ya tirkî qet naşibe hev, denganiya wan, hevoksaziya wan û peyvsaziya wan gelek dûrî hev in.

Em bîna ser angaştên der barê zarava û devokên zimanê kurdî de. Çawa ku di zimanên din de jî tê dîtin, di zimanê kurdî de jî devok û zarava hene. Ev zarava ev in:

- 1) kurmancî (kirdaskî)
- 2) kurmanciya naverast (sorani)
- 3) kirmanckî (kirdkî, dimilî, zazakî)
- 4) loranî.

Ji van zaravayan tenê li Tirkiyeyê kurmancî û kirmanckî hene.

Di zaravayê kurmancî de sê devokên bingehîn hene: botî, silîvî û mehmedî. Ji van, devoka botî ji bo zimanê nivîskî yê kurmancî wekî bingeh hatiye pejirandin. Rêziman, vekî û ferheng li gor

vê yekê hatine amadekirin.

Du devokên himî yên zaravayê kirmanckî hene: dêrsimî û sêwregî.

Zimanê kurdî ji mêj ve wek zimanê perwerde û hîndekariyê hatiye bikaranîn. Medreseyên kurdan palpişt û delîlên vê yekê ne. Di van medreseyan de ji bilî kurdî zimanê erebî jî hatiye bikaranîn.

Gotina dawî:

Zimanê kurdî têra xwe heye, ji bo ku kurd bi zimanê xwe karibin perwerde bibin û hîndekariyê pêk bînin, ji hêla zimên ve asteng pir kêr in. Ji bo hemû zimanan çî astengên zimanî hebin pir hindik ew ji bo zimanê kurdî jî hene. Ji bo ku perwerde û hîndekarî bi kurdî bê kirin astengên herî girîng astengên qanûnî yên Tirkiyeyê ne.

Çavkanî:

- 1) Ji bo agahiya berfireh binêrin Varlı, Abdullah; *Dîroka Dugelên Kurdan*, Derpêç 1, Weşanên Sîpan, Stenbol 1997& Çeliker, Celadet; *Kurtedîroka Alfabên ku Kurdan Bikaranîne*, Kovara Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê Zend, hejmar 2, sal 1994.
- 2) Aksan, Doğan; *Her Yönüyle Dil 1 (Ana Çizgileriyle Dilbilim)*, Türk Dil Kurum Yayınları, Ankara 1987.
- 3) Bedirxan, Emir Celadet & Lescot, Roger; *Kürtçe Dilbilgisi*, Weşanên Doz , Çapa pîncemîn Stenbol 2000.
- 4) Aksan, Doğan; *berhema navborî*.
- 5) Minorsky, Vladimir; *Kürtler*, Koral Yayınları, Çapa Duyemîn, Stenbol 1992.
- 6) Minorsky, Vladimir; *berhema navborî*.
- 7) *Şerefname*, Şerefhanê Bidlîsî, Hasat Yayınları, Çapa Duyemîn, Stenbol 1998.
- 8) Ciwan, Mûrad; *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanc Lehçesi)*, Weşanên Jîna Nû, Çapa Yekemîn, Swêd 1992.
- 9) Gökalp, Ziya; *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınlar, Çapa Yekemîn, Stenbol 1992.
- 10) Hesepûr, Emîr; *Nationalism and Language In Kurdistan*, Mellen Research University Press, Kanada 1992.
- 11) *Mem û Zîn*, Ehmedê Xanî, Hasat Yayınları, Çapa Sêyemîn, Stenbol 1990.
- 12) Minorsky, Vladimir; *berhema navborî*.

Let's Look Into Kurdish

Introduction

Kurds are living in the borders of four states. These states are Turkey, Iran, Irak and Syria. The official languages of these countries are Turkish, Persian and Arabic.

Turkish is from Ural- Altaic, Arabic is from Semitic and Persian is from Indo-European language families. Among these languages, only Persian is in the same language group with Kurdish.

However there is an interesting point that, both Arab and Persian official institutes and their laws admit Kurdish existence as an independent language. But Turkish Republic's current laws and officials still don't want to accept Kurdish language and its original character. Of course we can regard as an exception the recent positive negotiations and the projects which aim constitutional changings.

The idea to do not recognize the Kurdsh reality is especially spreaded after the years of Turkish republic foundation and became the formal ideology. As it is well known that before the Turkish Republican era Kurds were identified and known with their own language, culture and indentitiy.

For instance Evliya Çelebi in his well known work *Seyahatname* writes about Kurdish and its

dialects. He emphasises that Kurdish is an ancient and rich language and it is different from Hebrew and Persian languages.

Şemsettin Sami in his work *Kamul'ül Alam* and Ziya Gökalp in his articles and his work *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler* (Sociological Observation About Kurdish Tribes) tell that Kurdish is a rich and independent language and it does not resemble to other languages.

After the foundation of the Turkish Republic especially in the 1924 constitution the existence of Kurds were not recognized. Kurdish language and the Kurdish identity were refused. However we know that in many documents of the Ottoman Empire there are the expressions of the Kurd and the Kurdistan.

